Apê Mûsa Enter, li Amedê, ji hêla hêzên reş û tarî ve tê kuştin.

Dostaniya Yaşar Kemal û Apê Mûsa Enter , ji demeke dirêj ve ye . jiyana Apê Mûsa berdewam dike . Piştî kuştina Mûas Enter , Y . Kemal nivîsarekê, di der mafê wî de dinivîse . Ev nivîsar rojnama Tirk ya bi nav û deng " **Cumhoriyet** " , di rojên 26-27ê Sibata 1992 an de diweşîne . Emê hin parçeyên bijarte , ji wê nivîsarê pêşkêş xewndevanên Newrozê bikin .

" ***Apê Musa Enter , di rojên reş û tarî de , herdem ronak , hêvîdar û bawermend bû . Civak û mirov , çiqas xerap be , wî herdem quncikekî rind û qenciyek tê de didît . Nêrîn û gotinên mirovan , li hember wî çiqas ters û sertbana jî ; Wî bi çavekî nerim lê mêze dikir . Ew bi çanda gelê xwe pir bawermend bû . Bi hemî hêza xwe ve , li dijî wendabûna çanda gelê xwe disekinî û didît ku , çanda gelê xwe , ji çanda cîhanê re alîkar e . Ev bawerî , ta dawiya jiyana wî ajot û berdewam kir .. Ji ber baweriyên xwe ve , bi mêranî berxwe dida . Lewre jî hat kuştin . Kuştdar , an yên Apê Mûsa , dane kuştin , Tirkiyê jî xwerin , Anedol vegerandin gola xwînê . Ew kesan , xerpî û kuştina Tirkiyî dixwazin . Ev karê dîktetorên xwîndar in . Tirkiyê , divê neketa devê vê riyê . Em dikevin sedsala Bîst û Yekan , Ev leka reş di eniya me de , mirovatî napejrîne***" .

Di vê nivîsarê de , Y . K . Dîsan dike qêreqêr û banga xwe dike û welathezan , daku vê kuştinê ji holê rakin " ***Tirkiya û mirovatî , kuştina kevokên aştiyê , wek Mûsa Enter napejrîne . Ji ber , evqas sitem û piştî evqas xwînrijandin , lihevkirin pir zor e. Ez di bextê we de me , rê nêzîke , wext heye , ji bo xatirê xwîna yên wek Mûsa Enter , ji bo xatirê evîna biratiya hezar salan û ji bû bedewiya biratiya paşerojê , werin em vî karî çareser bikin , tiştekî ewqas dijwar nîne***" .

Yaşar Kemal , nivîsara xwe, bi van gotinan kuta dike : ***"Bi rastî , eger mirov bi qasî Mûsa Enter , ji welatê xwe hez bike – Eger demoqrasî hebe – emê ji vê astengê derkevin . Ji ber ku , baweriya min gelekî bi Mûsa Enterên vî welatî heye . Çi Tirk û çi Kurd be .***

Bila bijî Mûsayên Enter , Apê Mûsa "

Jêder :

1 - Kovara Reşen. Hejmar 1 . Sal 1996

2 - Kovara Nûdem. Hejmar 7 . sal 1993

****

Dumahîk:Ragihandina...

Jiyan , azadî û parastina kesayetiyê , ji mafê herkesekî ye .

Bend 4 :

Çênabe tu kes bindest an bê kolekirin . Û kolekirin û bazirganiya koleyan , di hemî rewşan de qedexe ye .*Bend 5 :*

Nabe tu mirov bê işkencekirin û cezakirin an jî danûstandinên hişk , hovane an jî yên ku , ji rûmetê kêmdikin vêre were kirin.